# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (245) | Gulan / 15-5-2023


# Berdewamiya buhakirina nirxê kelûpel û madeyên sereke yên xwarinê




Li Kurdistana Sûriyê her ku diçe nirxê kelûpel û madeyên sereke yên xwarinê zêde dibe bi taybet nirxê Şekir û Xazê, welatî jî gazinan ji nirxan dikin û dibêjin rewşa wan gelekî xerab e û ti aliyek bi hawara wan ve naçe.Di vê dema dawî li gelek bajarên Kurdistana Sûriyê madeya Şekir zehmet bi dest welatiyan dikeve û nirxê wê jî dighê 8000 hezar Lîreyên Sûrî û ev yek bargiraniyeke mezin li ser milê welatiyan durist dike. Welatiyek dibêje, madeya Şekir li Hesekê nîne, û heger hebe jî bi zehmet û bi nirxekî giran e, pêwîste çareseriyek ji vê pirsgirêkê re were dîtin û rewşa welatiyan xweş bibe, ne lojîk e madeyeke sereke ya xwarinê zehmet bidest bikeve. Welatiyek din dibêje, bazirganên mezin madeya Şekir di kogehên xwe hiştine heta nirx buhatir bibe, û sûdeke mezin jê bibînin, helbet ev Bazirgan şirîkê vê rêveberiyê ne, û parastina wan dikin lewma ew bi kêf û heza xwe nirxan datînin.


**Libnan.. Vegera bi zorê ya penaberên Sûriyê**

*Rûpel—2*

**«Vegera rejîma Esed ji bo nava Komkara Erebî tawan e»**

*Rûpel—3*

**Yadgeha Niştîmanî ya Barzanî**

*Rûpel—4*

# «PYD di ber girtina dergehê sînorî berpirs e»



**Kurdistan**

Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê berpirsiyaretiya girtina deriyê di navbera Herêma Kurdistanê û Kurdistana Sûriyê xist stûyê rêveberiya PYDê de û ragihand PYDê di ber girtina dergehê de berpirs e. Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê di daxuyaniya xwe de radighîne, Rêveberiya PYDê di rêya deriyê Sêmalka rê neda kesên vexwendî ji serkirdeyên ENKSê bo merasîmên vekirina Mûzexaneya Barzanî ya Niştîmanî de, derbasî Herêma Kurdistanê bibin, ku ew merasîm 11 û 12ê mehê birêve çûn.

> «Pêwîste PYD dest ji kiryarên xwe berde»

ENKSê daye zanîn ku tevî aliyê Emerîkî destêwerdan kir da ku kesên vexwendî ji serkirdeyên ENKSê bi hêsanî derbas bibin, lê PYDê bû rêgir û rê neda, ew kiriyar jî berûvajî bangên dûrxistina karê deriyê ji encindeyên PKKê tên. Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê amaje kir ku girtina deriyê dê bandoreke nerînî li ser xelkê Kurdistana Sûriyê bike, nexasim ew derî bi destpêşxeriya Serok Mesûd Barzanî hatibû vekirin û gelek alîkarî derbas dikrin. ENKS anî ziman jî ku ev kiryar di demekê de tê ku jiyana welatiyan zehmet bûye û di her warekî de têk çûye, di warê siyasî jî her diyalogek û danûstandinên Kurdî Kurdî têk birin dixwazin jiyana siyasî bi yekcarî ji nav bibin. Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê bang li aliyê Emerîkî kir ku fişarê li ser PYDê bikin da ku dest ji binpêkirinên xwe berde û deriyê li hember her aliyekî veke û ji encindeyên siyasî bi dûr bixe.

> « Divê dergeh ji ecindeyên siyasî were dûr xistin»

# Libnan.. Vegera bi zorê ya penaberên Sûriyê

**Bidûvçûn**

Hêzên ewlekariyê yên Sûriyê ji meha Nîsanê ve,  46 penaberên sûrî yên ji Libnanê hatine vegerandin girtine. Ji meha borî artêşa Libnanê bi ser malên malbatên sûrî de li cihên curbicur ên li seranserî welêt de girtin û nêzîkî 60 penaberên ku bi awayekî neqanûnî derbas bûne yan jî dema kartên wan ên niştecihbûnê bi ser çûne, ber bi Sûriyê ve vegerandin.
Di vê derbarê de, Rêveberê Rewangeha Sûrî ya Mafê Mirovan Ramî Ebdulrehman ji K24 re ragihand, hêzên ewlekariyê yên Sûriyê 46 penaberên vegerandî, girtin.
Libnan ji sala 2017an de, dest bi proseya vegerandina penaberan bo Sûriyê kiriye, di dema ku desthelata Libnanê dibêje proseya vegerê ne neçarî ye, Netewên Yekgirtî daxwaz ji Libnan dike proseyê rawestîne ji ber ku gelek ji penaberên vegeryayî rastî girtinê hatine.Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî (Amnesty) roja 25ê Nîsana borî bang li rayedarên Libnanî kir ku proseya dersînorkirinên penaberên sûrî rawestîne. Cîgira Rêvebirê Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê di Amnesty International de Aya Meczob got: “Ew gelekî xemgîn e ku artêş biryarê li ser çarenivîsa penaberan bide, bêyî ku rêzê li proseya rast bigire, yan rê bide kesên ku bi dersînorkirinê re



rûbirû ne, dersînorkirina xwe li dadgehê îtîraz bikin an daxwaza parastinê bikin.” Her wiha Aya Meczob got: “Nabe penaber ji bo cihekî ku jiyana wî lê di metirsiyê de be, bê vegerandin.” Li gor amarên herî nû, zêdeyî milyonekî penaberên Sûrî li Libnanê hene ku dikin %35ê nişteciyên wî welatî. Ji destpêka kirîza Sûriyê ve, 200.000 zarokên Sûrî li Libnanê ji dayik bûne. Niha hikûmeta Libnanê hewla vegerandina penaberên Sûrî dide û kampanyayeke kîndariyê jî li dijî penaberên Sûrî roj bi roj tund dibe. Lê hinek berpirsên xwecihî yên Libnanê red dikin ku penaberên Sûrî sedema kirîza Libanê û têkçûna aboriya wî welatî bin. Tevî ku Kampa Balûla ya penaberên Sûrî li Bîqaa rojava ya Libnanê niha hêmin e, lê ew yek ji wan navçeyan bû ku berî çend rojan artêşa Libnanê avêtibû ser û hinek penaberên Sûrî ji nav kampê radestî hêzên Sûriyê kiribûn. Ligel tevgera artêşa Libnanê kampanyayeke kîndariyê li ser medyaya civakî destpê kiribû û penaberên Sûrî wekî sedema têkçûna rewşa aborî ya Libnanê hatibûn tohmetbarkirin. Lê li ser edê rewş cuda ye.”Li gor amarên herî nû; 1.000.000 Penaberên Sûrî li Libnanê hene. 804362 Penaber li Komsyona Penaberan tomarkirî ne. 200.000 Zarokên Sûrî li Libnanê ji dayik bûne. %90 Ji penaberên Sûrî li Libnanê di jêr hejariya tund de dijîn.

# «Vegera rejîma Esed ji bo nava Komkara Erebî tawan e»



**Kurdistan**

Piştî 12 salan Sûriye j ibo Komkara Erebî hat vegeranin. Biryara li Qehîreyê di civîna wezîrên derve yên welatên endamên komkarê de hate ragirtin. Serokê Hevpeymaniya Niştimanî ya Opozîsyona Sûriyê Salim Muslat bi rêya daxuyaniyeke çapemeniyê ev biryara Komkara Erebî nas nekir û diyar kir ku ev biryara wê bibe sedem ku rejim zilma xwe zêdetir bike û hêza Îranê ya li herêmê jî berfirehtir bibe. Endamên Destaya Siyasî yên pozîsyonê jî biryarê ji bo dahatûya Sûriyê erênî nabînin û dibêjin bi vê biryarê destê opozîsyonê lawaz nebûye. Ji ber şerê nanxweyî Sûriye 12 sala berê endamtiya Sûriyê di Komkara Erebî de hatibû ragirtin. Bi vê biryara nû wê delegasyonên Sûriyê gav bi gav bêne qebûlkirin bo nava civînên Komkarê. Wezareta Karê Derve ya Sûriyê jî dibêje; ew ê vê biryarê bi baldariyeke mezin binirxînin û ji bo hevkarî û yekîtiyeke mezintir ya Ereban jî bangê dikin. Berdevkê Wezareta Derve ya Amerîka got, welatê wî di wê baweriyê de ye ku hevalbendên wan ên Ereb bi niyaz in ku pêwendiya rasterast bi Esed re deynin, ta ku fişarê ji bo çareseriya aloziya Sûriyê bikin. Her wiha got jî: "Washington bi hevalbendên xwe re li ser armancên dawî yên vê biryarê lihev dike." Wezîrên derve yên welatên Komkara welatên Erebî duhî li Qahîreyê civiyan, piştî civînê biryara hejmar 8914 derxistin û tê de ragihand, ji 7ê Gulana 2023an û pê ve şandên Sûriyê di civînên Encûmena Komkara Erebî û hemû saziyên girêdayî wê de beşdar dibin.

> **«Vegera Sûriyê bo Komkara Erebî stema rejîmê zêdetir dike»**

Wezîrê Derve yê Misirê Sameh Şukrî di civînê de got, tekane rêya çareserkirina kirîza Sûriyê, çareseriya siyasî û bêyî destêwerdana derve ye û got: "Ti çareseriyeke leşkerî ji aloziya Sûriyê re nîne." Komkara Erebî di sala 2011an de ji ber destpêkirina şerê navxweyî, endamtiya Sûriyê rawestandibû. Vegera Sûriyê bo hembêza wê ya Erebî, hevdem e ligel guhertina nexşeya siyasî ya herêmê, piştî rêkeftina Siûdî-Îranê, ku hêvî ji vê yekê tê kirin aramî li herêmê pêk were ku demeke dirêj ji ber nakokiyan nearamî heye. Wezîrê Derveyê Tirkiyê Mevlut Çavuşoglu da xuyakirin, civîna çaralî ya wezirên Derve yên Tirkiye, Sûriye, Rûsya û Îranê li Moskoyê berhemdar derbas bûye û bo çareserîya pirsgirêkan û danîna nexşerêyek, bi serokatiya cîgirên wezîrên derve komîteyek tê avakirin. Çavuşoglu got: "Me behsa pêşxistina proseya siyasî û giringiya amadekariyên vegerandina penaberan kir. Tirkiye dixwaze beyî ku tu pêşmerc hebin, prose berdewam be. Divê gavên kirdarî bên avêtin." Çavuşoglu diyar kir jî, her çar welat li ser şerê dijî PKK, YPG û DAIŞê hevnêrîn in û got: "Wek aliyên proseyê, me careke din piştevaniya xwe bo yekparçeyî û serweriya Sûriyê derbirî. Di şerê dijî PKK, YPG, DAIŞê de em hevnêrîn in." Ev daxuyaniya Çavuşoglu di demekê de ye, Wezîrê Derve yê Sûriyê Feysel Miqdad diyar kiribû, "Armanca sereke ji bo me, bidawîkirina hebûna leşkerî ya neqanûnî li ser xaka Sûriyê ye, helbet jî hêzên Tirkiyê jî di nav de ye. Bêyî pêşketin di vê mijarê de, em ê li cihê xwe bimînin û negihin encamên rast."

> **«Em pêwendiyên xwe ligel Esed asayî nakin»**



# Yadgeha Niştîmanî ya Barzanî





**Bidûvçûn**

Bi serperiştiya Serok Mesûd Barzanî û amadebûna bi dehan serkirde û kesayetiyên Kurdistanî, Iraqî û biyanî, Yadgeha Niştimanî ya Barzanî hat vekirin.Yadgeha Nîştimanî ya Barzanî (BNM), navendeke zanyarî û lêkolînê ye, ji bo ku nifşên bê wan êş û azarên nifşê berê ji bîr nekin. Bîranîn spardnameyek e ku behsa mana gelê Kurd dike û nameyeke berdewam a pêkvejiyan û aştiyê ye. Serdanger û nivîskar dikarin ji gelek çavkaniyên pirtûkxane û muzeyê sûd werbigirin, ligel hebûn pirtûkxaneyeke eliktironî ku li her devereke cîhanê bedrest dibe. BNM di heman demê de cîhê taybet ji bo semîner, konferans û pêşangehan peyda kiriye. Serdanger dikarin di nav dîrokê de rêwîtiyek bikin û di heman demê de dikarin bi bedewî û dîzayna nûjen a Yadgehê bibînin ku behsa serkeftina berxwedana sed salan a gelê Kurd a ku di encamê de azadî ji bo gelê me pêk hatiye, kêfxweş bibin.

Yadgeha Niştîmanî ya Barzanî saziyeke kulturî ya Herêma Kurdistana Iraqê ye ku ji bo bîranîna giyanê pak ê Mistefa Barzanî ye ku sembola tevgera berxwedana Kurd e. Li gor nêrîna Mistefa Barzanî bo Kurdistaneke yekgirtî, BNM rêzê li hemû serkirdeyên Kurd ên ku hilmetên mezin ji armanca azadiyê bi rê ve birine, digire. BNM saziyeke kulturî ye ku armanca wê hişyarkirina her aliyekî ye ku civaka Kurdistanê di çi re derbas bûye û çawa hatiye vê rojê. Ev jî ji bo nifşên Kurdistanê ye ku çawa bav û kalên wan ji bo bidestxistina mafên xwe di nava zor û zehmetî û êşan re derbas bûne.

Armanc BNM fêrkirina nifşên niha û yên paşerojê ye, di heman demê de êş û azarên miletê kurd li kêleka tevgera Barzanî û berdewamiya hewlên wî yên ji bo yasayên pêkvejiyanê, mafên kêmneteweyan û parastina xwezayê nîşan bide.

**Muzexane**

Muzexane bi hûrgilî hatiye dîzaynkirin ku ew çiya û şikeftên ku bi salan neteweya Kurd wek mertal parastiye, nîşan bide. Miletê Kurd hertim amaje bi wê yekê dike ku dostên wan tenê çiya bûne, loma jî muzexane malek e ji bo wan dostên rast. BNM serdangeran ber bi geşteke dîrokî dibe, bi riya nîşandana gelek wêneyan di galeriya xwe de û pêşandana berhemên dîrokî û çîrokên ku li gorî dema bûyeran hatine organîzekirin. Jûra şikeftê wek şikefta ku Mistefa Barzanî tê de demeke girîng derbas kiriye hatiye çêkirin. Barzanî û rêhevalên wî her tim di dema topbaran û şer de, şikeft wek cihê veşartinê bikar anîne. Şikeft her tim beşeke girîng a jiyana gundiyên herêmên çiyayî yên Kurdistanê mane. Yek ji taybetmendiyên wê ew e ku ew qadek mezin a li derve peyda dike ku tê de gelek bûyerên çandî bêne lidarxistin. Ev meydana mezin xwedî atmosferek pir aram e, ku bedewiya xwezayî ya deverê nîşan dide.


Di Yadîgehê de jûreke şanoyê heye ku bi riya kurtefîlmên û belgefîlman re, dîroka Barzanî pêşkêş dide, her wiha galeriyek jî heye ku berhemên wênesazên navdar ên herêmê nîşan dide.

Di heman demê de holeke civînan li BNM heye û çend jûrên semîneran ji bo her cûre konferans û semîneran jî vedihewîne. Yek ji armancên wê ew e, rêjeyeke berfireh ji jêderan ji lêkolîner û xwendevanan re peyda bike.

Pirtûkxaneyek li Yadîgeha Niştimanî ya Barzanî heye ku tê de hejmareke berçav ji pirtûk û belgeyan tê de hene.



# «Bûke Kurdistan»


Hiyam Ebidulrehman

Ewa çavê xwe kildayî
Cilkêt kurdî girêdayî
Xwe di rextande pêçayî
Çelenga Jina leyîla bû
Ewa biskê xwe badly
Bekle sipî ser danayî
Ebrû ji çavan hildayî
Ciwana jinan leyîlabû
Ewa soz û peyîman dabû
Xebatkarek pir hêjabû
Jibo welat can fîdabû
Ewû çeleng bi xwe leyîla bû
Ew gotî bi Kurdistan
Sund dixum bi nav û nîşan
Barzaniya biniştîman
Qehremanî jê xuyabû
Berî herê sêdardanê
Biskê xwe birîn wê cane
Got bihêvîme kes negrî
Ezm bûka kurdistanê.